Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi 2020 8(UMS'20) 71–79

Journal of Social Sciences of Mus Alparslan University

anemon

Derginin ana sayfası: http://dergipark.gov.tr/anemon

*Araştırma Makalesi ● Research Article*

# Di Edebîyata Zarokan ya Kurdî da Nûnerek ji Nifşê Nû: Berfin Ayşe Öğüt*

## *Kürt Çocuk Edebiyatının Son Dönem Temsilcilerinden Berfin Ayşe Öğüt*

## *One of the Recent Representatives of Kurdish Children's Literature: Berfin Ayşe Öğüt*

İlyas Suvağci [a,**]

[a] Dr. Öğr. Üyesi, Hakkâri Üniversitesi, Rektörlük Türk Dili Bölümü, 30000, Hakkari/Türkiye.
ORCID: 0000-0001-6409-1229

MAKALE BİLGİSİ

*Makale Geçmişi:*
Başvuru Tarihi: 26 Kasım 2020
Düzeltme Tarihi: 16 Aralık 2020
Kabul Tarihi: 20 Aralık 2020

Anahtar Kelimeler:
Çocuk
Çoçuk Edebiyatı
Kürt Çoçuk Edebiyatı
Berfin Ayşe Öğüt
Edebiyat Temsilcileri

ÖZ

Kürt çocuk edebiyatının temeli; iki dilli klasik sözlükler, dini çocuk eserleri, Kürt folkloru ve tercümelere dayanır. Bu edebiyatın son dönem temsilcileri üzerinde çok az çalışma yapılmıştır. Bizler de bu çalışmamızda bu kuşağın son dönem temsilcilerden olan B. Ayşe Öğüt'ün eserleri üzerinde durduk; böylece araştırmacıların dikkatlerini bu kuşağın edebi üretimi üzerine çekmek istedik. Öğüt'ün eserlerindeki toplumsal cinsiyet, folklor, eserlerin dili ve görsellik gibi unsurları Çocuk Edebiyatı kıstaslarına göre inceledik. Yazarın, eserlerinde toplumsal cinsiyet klişelerinden kurtulmaya çalıştığını, çocuklara Kürt folklorunu temel bir kaynak olarak işaret ettiğini tespit ettik. Öğüt'ün, sade ve yapmacıksız bir dil ile eserlerini yazmak için çabaladığını gördük. Onun eserlerinde görsellik açısından yazı ile resim arasında bir denge gözetilmiştir.

ARTICLE INFO

*Article history:*
Received 26 November 2020
Received in revised form 16 December 2020
Accepted 20 December 2020

Keywords:
Child
Children's Literature
Kurdish Children's Literature
Literary Representatives
Academic Staff

ABSTRACT

Kurdish children's literature is based on bilingual classical dictionaries, religious children's works, Kurdish folklore and translations. There are very few studies on recent representatives of this literature. We focused on the works of B. Ayşe Öğüt, one of the last representatives of this generation. Thus, we draw the attention the literary production of this generation. According to the criteria of Children's Literature, we examined issues such as gender, folklore elements, language of the works and the visual element in Öğüt's works. She tried to get rid of gender stereotypes in her works and showed children Kurdish folklore as a basic resource. Öğüt strives to write in a non-artificial language. A balance has been observed between writing and painting in terms of visuality in her works.

AGAHİYÊN GOTARÊ

*Rabirdûya Makaleyê:*
Dîroka serlêdanê: 26 Mijdar 2020
Dîroka sererastkirinê: 16 Berfenbar 2020
Dîroka pejirandinê: 20 Berfenbar 2020

Peyvên Sereke:
Zarok
Edebîyata Zarokan,
Edebîyata Zarokan ya Kurdî
Berfin Ayşe Öğüt,
Nûnerên Edebîyatê

KURTE

Bingehê Edebîyata zarokan ya Kurdî xwe dispêre ferhengên klasîk yên du zimanî, berhemên dînî yên zarokan, folklora Kurdî û wergerê. Li ser nifşê dûmahîkê yê vê edebîyatê pir kêm xebat hatine kirin. Em jî di vê lêkolîna xwe da li ser berhemên nivîskarek ji vî nifşî B. Ayşe Öğütê disekinin û dixwazin bala lêkolîneran bikêşin hilberîna edebî ya vî nifşî. Me mijarên wekî zayenda civakî, hêmanên folklorê, ziman û dîtbarîya berhemên Öğütê li gor pîvanên edebîyata zarokan vekola. Me dît nivîskarê hewil daye xwe ji klîşeyên zayenda civakî xelas bike û hêmanên folklora Kurdî wekî çavkanîyeka sereke nîşanî zarokan bide. Öğütê xwestîye bi zimanekî xwezayî û sade çîrokên xwe vebêje. Di berhemên wê da ji alîyê dîtbarîyê ve jî di navbera wêne û nivîsan da hevsengîyek heye.

## 1. Destpêk

Berhemên ji bo zarokan yan jî li ser wan hatine nivîsandin di bin sernavê edebîyata zarokan tên nirxandin. Nimûneyên ewil yen vê edebîyatê li ser bingehê folklorê û bi cureyên wekî fabl, lorî, zûgotinok, çîrok, qewlêrk hwd. tê dîtin. Piştre jî bi awayekî nivîskî jî em pêrgî berhemên zarokan tên.

* Bu çalışma, 22-23 Ekim 2020 tarihlerinde Muş Alparslan Üniversitesinde düzenlenen II. Uluslararası Muş Sempozyumunda sözlü bildiri olarak sunulmuştur.
** Sorumlu yazar/*Corresponding author*.
e-posta: ilyascembeli@gmail.com

e-ISSN: 2149-4622. © 2013-2019 Muş Alparslan Üniversitesi. TÜBİTAK ULAKBİM DergiPark ev sahipliğinde. Her hakkı saklıdır.
http://dx.doi.org/10.18506/anemon.832150

Di edebîyata zarokan ya Kurdî da jî nimûneyên ewil yên nivîskî di nav çanda edebîyata klasîk da derketine holê. Kesên wekî Ehmedê Xanî (*Nûbihara Biçûkan*, 1683), Îsmaîlê Bazîdî (*Gulzar*,?), Şêx Marûfê Nodeyî (*Luxetnameyî Ehmedî*, 1790), Mewlewî (*Eqîdeya Mewlewî*), Şêx Mihemed Kerbelayî (*Mîrsadu'l-Etfal-Şahrahê Kûdekan*, 1912), Evdirrehîm Rehmî Hekkarî (*Dersa Dîn*-1921, *Kilîla/Mifteya Xwendinê: Elifbêya Kurdî, 'Eqîda Îmanê/'Eqîda Kurdan*) bi ferhengên du zimanî û eqîdenameyan xwestine zarokên Kurdan hînî Kurdî bikin yan jî di perderwedîya dînî da bibin alîkarê wan (Tosun, 2018:148; Tek, 2019:57).

Heke em bi awayekî kronolojîk li vê geşedanê binêrin em dibînin ku Kurdên Sovyetê materyalên dersan ji bo zarokan amade kirine. Li Sûrîyê di kovara Hawarê da K. Ali Bedirxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Celadet Bedirxan, helbestên zarokan û fabl nivîsandine. Piştre li Tirkîyê bi berhemên M. Emîn Bozarslan (*Meyro, Mîr Zoro, Gurê Bılûrvan, Kêz Xatûn* hwd.) vê qonaxê berdewam kirîye. Piştî salên 1980î jî li Ewropayê kovar û berhemên zarokan hatine weşandin. Di vê serdemê da ligel Mahmûd Baksî (*Zarokên Îhsan, Keça Kurd Zozan*), Kemal Burkay (*Aliko û Baz*) kesên wekî Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Haluk Öztürk, Firat Cewerî ji bo zarokan helbest, fabl, çîrok û pirtûk nivîsandine. Di weşanxaneyên Nûdem û Apec da bi wergerên ji zimanên bîyanî (nemaze jî ji Swêdî) berhemên zarokan bo Kurdî hatine wergerandin û çapkirin. Her wiha kovarên zarokan ên wekî *Hêlîn, Hêvî, Kulîlk, Hêviya Me, Koçer* hwd. hatine weşandin (Tosun, 2018).

Li Tirkîyê di kovara *Nûbihar*ê da ji bilî beşên bo zarokan hatîye terxankirin kovarên zarokan yên wekî *Dergûş, Şemamok, Agirê Tûtê, Zarokên Rojê, Perperok, Bûka Baranê* hwd. hatine weşandin. Li Îranê; *Gir û Gallî Mindallanî Kurd, Estêre, Dinyayê Mindallan, Nêrgiz, Sirwe* hwd. li Iraqê jî kovarên zarokan yên wekî *Govarî Estêre, Pepûle, Pereshêlke, Cigergoşekan* hwd. hatine weşandin. (Subaşı, 2017)

Di van salên dûmayîkê da jî li Tirkîyê weşanxaneyên zarokan yên wekî Hîva, Morî hatine avakirin. Her wiha weşanxaneyên din jî di weşanên xwe da zêdetir cih didin berhemên zarokan. Ev jî nîşan dide ku eleqeya li ser edebîyata zarokan her ku diçe zêde dibe û nivîskarên nû dest bi nivîsandina berhemên zarokan dikin. Berfîn Ayşe Öğüt jî yek ji nivîskarên vî nifşê dûmahîkê ye. Her çend temenê wê ciwan e jî wê heta niha çar berhemên zarokan nivîsandine. Lewma bi dîtina me ji bo dîyarkirina rewşa edebîyata zarokan ya Kurdî ew nimûneyeka balkêş e. Çend xebatên li ser edebîyata zarokan ya Kurdî li ser ferheng û berhemên dînî û kovarên zarokan hatine kirin. Lewma derbarê nifşê dûmahîkê yê vê edebîyatê pir kêm xebat hene. Bi vê xebatê me xwest bala lêkolîneran bikêşin ser vê valahîyê û di vê qadê da rê li ber zêdetir xebatan vekin. Ka gelo di vî nifşê dûmahîkê da kîjan nav derdikevin li pêş û mirov dikare berhemên wan li gor pîvanên edebîyata zarokan çawa binirxîne, di van berheman da bêtir kîjan mijar tên dîtin. Em di vê lêkolîna xwe da wê li ser nivîskarîya Öğütê bisekinin ka gelo wê di berhemên xwe da mijara zayenda civakî çawa bi cih kirîye, ji folklora Kurdî sûd wergirtîye yan na, zimanê wê û dîtbarîya berhemên wê di çarçoveya edebîyata zarokan da mirov dikare çawa analîz bike. Pêşîyê em dê li ser jînenîgarîya Öğütê agahîyeka kurt bidin, piştre jî berhemên wê di çarçoveya pîvanên edebîyata zarokan da binirxînin.

## 2. Nifşê Nû yê Edebîyata Zarokan ya Kurdî û Berfîn Ayşe Öğüt

Wekî berî niha jî me dîyar kir di çend salên dawîyê da her ku diçe eleqeya li ser berhemên zarokan zêde dibe. Li Tirkîyeyê di çarçoveya berhemên zarokan da pirtûkên perwerdehîyê, çîrokên Kurdî, nimûneyên folklora zarokan hwd. hatine çapkirin. Di nav nivîskarên vî nifşê dawî da ji bilî B. Ayşe Öğütê kesên wekî Yasemîn Elban, Bêrî Bihar, Berfîn Îde Demiral, Aynur Özbay, Roza Metîna, Mahmûd Nêşîte, Mem Bawer, Mîran Janbar, Mûrad Dildar, Rûken Çalıştıran, Şükran Çaçan, Janya Acar, Omer Dilsoz, Hasip Yanlıç, Hîva Yüce, Ronî War, Seyhan Karakoç, Abdullah Yapıcı, Amed Gernas, Amed Tîgrîs, Rustem Felat, Yunis Bahram, Benûşe Elewîferd, Selîm Temo, Îshak Tepe, Orhan Budak, Konê Reş, Kerem Tekoğlu, Newaf Mîro, Hesen Huseyîn Denîz, Mustafa Rêzan, Îkram Îşler, Çetoyê Zêdo, Îsmaîl Dîndar, Ferîdûn Birgül, Perwîz Cîhanî, Yaqob Tilermenî, Xecê Rêdûr, Rojbîn Özkan, Eskerê Boyîk, Hekîm Atay (Yorulmaz, 2016;Pirtukakurdi.com, 03.09.2020) bi berhemên xwe yên zarokan yan jî berhevkarîya folklora zarokan derdikevin li pêş. Bêguman ev kesên navborî hemû hevtemen nînin û hinek ji wan demeka zû dest bi nivîsandina berhemên zarokan kirine, hinekan jî nû destpê kirîye. Lewma divê bê zanîn bi gotina "nifşê nû" mebesta me ew kes in ku ji piştî salen 1980î heta niha berhemên zarokan nivîsandine.

Nivîskara ku berhemên wê bûne bingeha vê xebatê Berfîn Ayşe Öğütê di sala 1993an da li Qizilxaca Mûşê ji dayîk bûye. Piştre beşa civaknasîyê li Zanîngeha Bedlîsê beşa Beytarîyê xelas dike. Herî dawî jî li Zanîngeha Munzurê dest bi beşa Îngilîzî û Wergerîyê dike. Ji bilî berhemên zarokan yên wekî *Xezal û Qertel, Kewên Gozel, Şînmorîka Zînê, Dara Pîroz* berhemek bi navê *Lehengên ku Çîrokên Xwe Terikandine* wergerandîye Kurdî. Mijara berhemê li ser îstîsmarkirina zarokan e. Öğütê her wiha edîtorîya kovara *Bar*ê jî kirîye (inanolo.blogspot, 10.07.2020).

Öğüt li ser sedemê bi Kurdî nivîsandina berhemên zarokan dibêje ku di zarokatîya wê da ji bilî çîrokên bi devkî ji bo zarokan çîrokên nivîskî yên kurdî tunebûne. Lewma ji bo ku vê kêmasîyê dagire û zarokên Kurd ji berhemên nivîskî bêpar nemînin wê dest bi nivîsandinê kirîye (Ortadogunews, 13.07.2020).

## 3. Nirxandina Berheman Ji Alîyê Edebîyata Zarokan ve

### 3.1. Bûyersazî

*Xezal û Qertel*

Di vê berhemê da behsa hevaltîya xezal û qertelekê tê kirin. *Xezal û Qertel* du hevalên baş in. Bi roj her du li dû karûbarên xwe diçin lê li şevê tên ba hev ji têjik û karxezalan ra çîrokan dibêjin, şevbihêrkan dikin. Rojekê bêyî ku haya wan ji hev hebe ji cih û warê xwe, Çîyayê Sîpanê ber bi rojava ve diçin. Nêçîrvanek dehfikê li ber Xezalê datîne. Qertel li esman nêçîrvanî dibîne û dixwaze Xezalê ji nav destê wî xelas bike. Ew êriş li nêçîrvanî dike lewma nêçîrvan guleyan ber dide wê. Qertel birîndar dibe, Xezal wê li ser pişta xwe tîne Çîyayê Sîpanê. Piştî demekê Qertel sax dibe.

*Kewên Gozel*

Dengxweş û Rengxweş du kewên cot in. Ew li deşta Mûşê di hêlîna xwe da bi awayekî bextewar dijîn. Rojekê Dengxweş dibêje ew dixwaze biçe li pişt Çîyayê Sîpanê Behra Wanê bibîne. Herçend ku Rengxweş naxwaze ew here jî nikare wî qanih bike. Dengxweş piştî rêwîtîyeka dirêj digihe Çîyayê Sîpanê. Li wir pêşîyê bayek, bi dû ra bahoz û baranek dest pê dike. Dengxweş şilopilo dibe bi kotekî diçe li bin zinarekî. Piştî baran xelas dibe ew ziwa dibe, dîsa rêwîtîya xwe berdewam dike. Vê carê jî qertelek wî dibîne dikeve li pey wî. Hema bibêje kêlika wî bigire qertel berxikekê dibîne û ji dû Dengxweş vedigere. Herçend ku Dengxweş gelek ditirse jî bi rojan berdewamî rêwîtîya xwe dike. Ew baxçeyekî gelek xweş dibîne, tê da jî kewek êm dixwe. Dengxweş jî tê nik kewê dest bi xwarina êmî dike lê dikeve dahfikê.

*Şînmorîka Zînê*

Zînê keçikeka heft salî ye. Rojekê ew diçe ji bo dayîka xwe kulîlkan kom bike di wê navberê da morîka wê diqete, dikeve avê. Çûkek tê morîka wê dixe nav nikilê xwe û dibe. Zînê diçe ji şivanî pirs dike ka ew dikare çawa wê çûkê bibîne. Şivan jî jê ra behsa Feqîyê Teyran dike, dibêje ew zimanê teyran dizane lewma dikare alîkarîya te bike, heke tu biçî ji rûspîyên gund bipirsî ew ê cihê Feqîyê Teyran ji te ra bibêjin. Zînê jî vedigere malê, ji kalê hilhilî pirsa Feqî dike û cihê wî hîn dibe, diçe nik wî. Jê ra behsa serpêhatîya xwe dike. Feqîyê Teyran jî ji mîrê teyran ra dibêje ku bila ji hemû teyran ra meseleyê ragihîne. Piştre mîrê teyran morîka Zînê dibînê û dide wê

*Dara Pîroz*

Zerya keçikeka neh salî ye. Ji ber ku zikê wê diêşe wê dibin nexweşxaneyê. Diktor dibêje ku ew qebz bûye lewma divê mişmişên bêderman û bêhormon bixwe. Babê wê li tu cihan van mişmişan peyda nake. Piştî Zerya ji nexweşxaneyê vedigere mala xwe, radizê. Di xewna xwe da dibîne ku ji dareka mişmişê çend liban dixwe û sax dibe. Gava hişyar dibe xewna xwe ji dayîka xwe ra dibêje. Dayîka wê jî dibêje ku wekî di xewna xwe da dîtîye, li gundê xalê wê darên mişmişê yên nedermankirî hene. Lewma dêya wê ji xalê wê mişmişên van daran dixwaze. Piştî mişmiş digihin destê wan, Zerya wan dixwe û sax dibe. Lewma Zerya dixwaze wekî di xewna xwe da dîtîye dara mişmişê bibîne. Zerya û dêya xwe diçin gund. Xalê wê Zeryayê dibe nik vê dara mişmiş jê kom kirîye. Zerya çawa ku di xewna xwe da dîtîye wê darê av dide. Ligel dayîka xwe dîsa vedigere mala xwe.

## 3.2. Zayenda Civakî

Karakterên di edebîyata zarokan da dirûvekî dide fêhma zarokî ya nirx û erkên (Ing. role) ji alîyê civakî ve hatine pejirandin. Bi rêya van karakteran zarok hîn dibe ka jin û mêr divê çawa tevbigerin (Kortenhaus û Demarest, 1993:220). Lê zarok ji bilî van berheman bi lorîyên dayîka xwe, di her gaveka jîyana xwe da li ser mijara zayendê tiştan hîn dibe. Dizane ku ew keç e yan jî kur e, taybetîyên zayenda xwe nîşan bide. Lewma di berhemên edebîyata zarokan da em pêrgî mijara zayenda civakî tên. Wate, ligel zayenda jinê yan jî mêrî li gor pîvanên zayenda civakî divêt jin wekî jinan, mêr jî wekî mêran tevbigerin. Ve yekê jî gelek klîşe (Ing. stereotype) bi xwe ra anîne. Wekî mînak mêr bihêz e, biryardar e, aktîv e û serdest e. Jin jî qels e, bêbiryar e, pasîv e û bindest e. Di berhemên edebîyata zarokan da jî di navenda bûyeran da bi gelemperî karakterên mêr cih digirin û ew xwedan statûyên payebilind in. Jin jî beranberê vê yekê; bende, hestîyar, ehmeq, pepûk, nazik, kedî ne (B. Diekman û Murnen, 2004:376; Tsao, 2008:110).

Di berhemên Öğütê da jî nivîskar hewil dide zêdetir cih bide mijara zayendê û xwe ji klîşeyên zayenda civakî xelas bike. Lewma lehengê van berheman jin in, navenda bûyersazîyê da jî ew cih digirin. Lê dîsa jî di hinek mînakan da wê xwe ji klîşeyên zayenda civakî xelas nekirîye.

Di çîroka *Xezal û Qertel*ê da her du lehengên ajal yên sereke mê yan jî jin in. Derbarê zayenda têjikan da tiştek nehatîye gotin. Lê em dizanin ku bi tenê nêçîrvan wekî mêr hatîye nîşandan. Gelo mirov dikare vê çîrokê di çarçoveya zayenda civakî da wekî hewildaneka avakirina deqeka dijî serdestîya mêran binirxîne? Bi dîtina me ev pêkan e. Di çîrokê da behsa jîyanek aram tê kirin. Wekî mînak Xezal di nav çîya û daristanan da digere, ji kanîyan ava sar vedixwe. Wexta şevê vedigere nav karxezalên xwe guhanên wê tijî şîr e. Her wiha Qertel jî diçe Behra Wanê, bi masîyan xwe têr dike, ji têjikên xwe ra jî xwarinê dibe. Mêr (nêçîrvan) jî dixwaze vê atmosfera erênî xira bike lê di dûmayîkê da ew nikare.

Di çîroka *Kewên Gozel* da em zayendê li ser mînaka du kewên cot dibînin. Ew gelek ji hev hez dikin. Nêrekew (Dengxweş) naxwaze li cihê xwe bisekine, her li dû serpêhatîyan e. Zayenda jin (ji bo ajalan mê) jî wekî erkên xwe yên zayenda civakî nîşan bide her li malê ye, naxwaze hevserê wê Dengxweş biçe û hêlîna wan xera bibe. Lê Dengxweş xeberê jina xwe nake. Derketina Dengxweşî bo rêwîtîyekê û encama wê ya nebaş di çarçoveya zayendê da em dikarin çawa binirxînin? Wekî dijberkirina rolên zayenda civakî di vê mînakê da em dibînin ku rola li ser jinan hatîye ferzkirin vê carê li mêrî hatîye spartin. Wekî klîşeyekê jina ku xeberê malbata xwe neke ji mala xwe dûr dikeve û di dawîyê da pêrgî encameka nebaş tê. Lê li vir yê ku xeberî jina xwe neke mêr e û ew dikeve dahfikê. Ev jî nîşan dide ku nivîskarê bi vê mînakê xwestîye rolên zayenda civakî berovajî bike.

Di çîroka *Şînmorîka Zînê* da lehenga çîrokê Zînê keç e û ew gelek baş li hespî siwar dibe. Wexta ew dixwaze biçe nik Feqîyê Teyran "di berbangê de li hespê xwe siwar dibe" û "di nav lat û zinaran de hespê xwe dibezîne" (r.16). Hespê Zînê jî "şînboz" e. Lê dîsa Zînê keçeka "delal û nazenîn" e, "bi eşq û evîn" dijî (r.18).

Di berhemên zarokan da di behskirin û ragihandina çîrokê da wêne jî cihekî girîng digire. Li gor lêkolînan di van berheman da ligel naverokê di ziman û wêneyan da jî em klîşeyên zayenda civakî yan jî pêşdarazîyên zayendî dibînin. Di wêneyan da jin di erkên navendî û mijarên sereke da kêm tên temsîlkirin û her wiha ew negirîng, bi awayekî kevneşopî bi erkên xwe yên pasîv û çavdêr tên nîşandan (Tsao, 2008:109-110). Di *Şînmorîka Zînê* da jî nimûneyeka dî ya têkildarî zayendê li ser nîşandayîna jinê ye. Dayîka Zînê ligel cînarên xwe li bin sîya darê rûdine û ew ji xwe ra sohbetê dikin. Di wêneya da jî jin wekî bi tenê rûdinên û ji bilî sohbetê tiştekî dî nakin hatine nîşandan:



Di nav civaka Kurdan da her çi gava muşkîleyek hebe mêr ji bo şêwirandin û çareserkirinê diçin nik "rûspîyan", jin jî diçin nik "Serspîyan" yan jî "Serejinan". Wekî rûspîyan serspî jî muşkîleyan çareser dikin. Zînê jî wexta ji şivanî alîkarîyê dixwaze û şivan ji wê ra dibêje here ji rûspîyan bipirse, Zînê tê ji "kalikê hilhilî" dipirse. Ji ber vê yekê Öğütê ev klîşeya zayenda civakî dubare kirîye.

Di *Dara Pîroz* da lehengê çîrokê dîsa keç e. Zerya, wekî keçikek gelek xweşkok hatîye nîşandan. Porê wê zer e, rûyê wê wekî rojê ye, ew şîrîn û rûken e. Gava ew dikene xemzeyek biçûk li ser dêma wê çêdibe. Dêya wê wexta pora wê dihûne carinan dike "çilkezî". Pişîkeka Zeryayê heye û ew gelek hez ji pişîka xwe dike. Ev taybetmendî hemû nîşan didin ku Zerya wekî her keçikeka ji rêzê ya di civakê da ye. Li gel Zeryayê bijîşk û hemşîre jî jin in. Lewma derbarê zayendê da em dikarin bi tenê bibêjin ku wekî çîrokên *Öğüt*ê yên din nivîskarê xwestîye lehengên xwe ji nav jinan hilbijêre. Lê dîsa jî wexta Zerya diçe gund li wir dibîne ku jinên gund bi satilan avê dikêşin malê. Lewma ev jî nîşan dide ku rolên ku civak li ser zayenda jinê ferz dike lêre jî hatîye dubarekirin.

### 3.3. Peyamên Bo Zarokan

Di berhemên zarokan da nivîskar bi rêya vegotina bûyer û serpêhatîyan dixwaze peyamekê bide zarokan û nirxên exlaqî yên civakê nîşanî wan bide. Em di berhemên Öğütê da jî vê yekê dibînin.

Di *Xezal û Qertel*ê da wexta Qertel talûkeyê dibîne dixwaze Xezalê xelas bike û bi canfîdayî êriş li nêçîrvanî dike. Erê ew birîndar dibe lê Xezal jî nayê kuştin. Piştre Xezal jî bi heman awayî Qertelê li ser pişta xwe heta Çîyayê Sîpanê dibe. Wekî encam em dikarin bibêjin ku ev çîrok ji zarokan ra behsa girîngîya hevaltî û alîkarîyê dike. Her wiha têjikên Xezal û Qertelê bihevra dileyizin lewma di vê mînakê da jî tê dîtin zarok ji ajalên din yan jî mirovên din ra hurmet nîşandayînê hîn dibin. Hevaltîya têjik û karxezalan jî wekî nimûneya pêkvejîyanê dikare bê şîrovekirin.

Xezal û Qertel ji bo ku cihên nû bibînin ji Çîyayê Sîpanê dûr dikevin, dest bi rêwîtîyeka nedîyar dikin. Ev jî peyamekê dide zarokan, ji bo ku ew cihên nû bibînin, jîyanên cuda nas bikin, çîrokên nû bibihîzin divê carinan mekanê xwe biguherînin. Jixwe di rêwîtîyê da zarok bi serpêhatîyên nû, ji bo çareserkirina muşkîleyan dikevin nav hewldanan, xwe nas dikin, hay ji taybetîyên xwe yên xurt û qels dibin. Lewma di dûmahîkê da ew ne ew kes in wekî dest bi rêwîtîyê kirine. Wexta Xezal jî ber bi rojava ve diçe pêrgî lîlozan, xwezayeka bi rengê sor xemilandî tê lewma gelek bextewar dibe.

Wekî çîroka *Xezal û Qertel*ê di *Kewên Gozel* da jî em dibînin ku Dengxweş ji bo ku xwe ji acizîya xwe xelas bike, tiştên nû bielime dikeve rêwîtîyeka dirêj lê vê carê encam neyênî ye. Kewa mê Rengxweş dibêje herçend ku çûyîna cihên dûr, dîtina cihên cuda gelek xweş e jî ew dîsa Dengxweşî li hember xetereyan hişyar dike. Lê Dengxweş jê ra dibêje *"haya min ji hemû xetereyan heye. Dibe ku ez hinek astengiyan bikişînim, lê di dawiyê de ez ê bibim kewekî alim û zana"* (r.4). Lewma ew ji fikra rêwîtîyê venagere. Di dawîya çîrokê da em dibînin ku Dengxweş ji vê rêwîtîya xwe serpêhatîyan derdixîne lê êdî ew ketîye dehfikê û poşman dibe ku xeberê Rengxweşê nekirîye. Dibêje ku *"Xwezî ez niha di hêlîna xwe ya germ de, li kêleka hevala xwe ya Rengxweşê bûma"* (r.10). Di destpêka vê çîrokê da dibe ku zarok ji bo keşifkirina cihên nû û hînbûna ji serpêhatîyan daxwaza rêwîtîyekê bikin lê di encamê da ji ber biserneketinê ew daxwaza wan cihê xwe ji poşmanîyê ra bihêle. Lewma êdî ew tu car wê hêzê di xwe da nebînin ku bikevin rêwîtîyekê û ji mala xwe bi dûr bikevin. Ji vî alîyî ve ew mijar li gor pîvanên edebîyata zarokan hinek bimuşkîle ye. Lê ji alîyekî dî ve jî ji bo ku zarok hîn bibin û di dawîyê da poşman nebin divê ew şîret û hişyarîyên malbata xwe guhdar bikin.

Wexta behsa bextewarîya Dengxweşî û Rengxweşê tê kirin wiha tê gotin: *"Di wê hêlîna xwe ya xweşik de bi awayekî bextewar dijiyan. Hemû ajalên derdorê ji wan didexisîn"* (r.2). Gelo çima mirov ji bextewarîya yekî/a din hesûdîyê bike? Ji ber ku piştî vê hevokê li ser têgeha hesûdîyê tu tiş nehatîye gotin ev hevok bi tena serê xwe maye. Lewma zarok ji vê hevokê dibe ku wateyên nebaş jî derxîne û ji her kesê/a bextewar ra hesûdîyê jî bikin. Bi dîtina me ev ji derveyî pîvanên edebîyata zarokan yên têkildarî nirxên exlaqî ye.

Di rêwîtîya xwe da wexta cara ewil Dengxweş di bin baraneka gur da dimîne herçend rewşa wî gelek nebaş dibe, "gelek bêtaqet û bêhal" dimîne jî ew dîsa venagere hêlîna xwe. Ev rewşa wî wekî *"Lê dîsa jî dev ji rika xwe ber neda*" (r.10) hatîye vegotin. Lewma nivîskarê xwestîye bala zarokan bikêşe li ser rikdarîyê û bibêje ku ew xisleteka nebaş e. Piştî ku di bin baranê da dimîne Dengxweş vê carê jî bi zorîyê xwe ji lepên qertelekê xelas dike lê wekî her car "piştî ku ew digihe firehîyê" dîsa hêlîna xwe ji bîr dike. Lêre jî li ser vê jibîrkirinê û belku jî ji zarokan ra "Dema ku we xwe ji talûkeyekê xelas kir hema ji rewşa xwe ya rastî bi dûr nekevin, her tiştî ji bîr nekin û xwe ne lêhbînin" tê gotin.

Di edebîyata zarokan da ligel mijarên wekî hezkirin, bawerî û dilovanîyê divê ji zarokan ra behsa alîyên jîyanê yên neyînî jî bê kirin. Lewma yek ji mijarên girîng behskirina mirinê ye. Zarokên pêşdibistanê her mijarê bi awayekî şênber difikirin, dixwazin her tiştî hîn bibin li ser her tiştî pirsan dikin. Lewma wekî têgeheka nedîtbar behskirina mirinê bo van zarokan zihmet e. Jixwe ji bo mezinan jî têgeha mirinê bisahm e. Lewma heke em bi awayekî reşbîn bo zarokan behsa mirinê bikin dibe ku heta dûmayîka temenê xwe ew li ser derûnîya wan tesîreka neyênî bike (Şen, 2016:16). Lewma divê em bi awayekî hêsan, dîtbar lê bi peyv û hevokên bicih ji zarokan ra behsa mirinê bikin. Lê dema Öğüt di *Kewên Gozel* da wexta ji zarokên pêşdibistanê ra behsa mirinê dike ji derveyî vê qaydeyê maye. Wexta qertelek êriş li Dengxweşî dike, digihe wî, hema bibêje dê wî bigire nivîskar dengê Dengxweşî yê

bitirs digihîne zarokan. Dibêje ku wî *"Stûyê xwe li ber mirinê dirêj kiribû*"(r.12) û *"cara peşîn bû ku ewqas tirsiya bû û mirinê li ber çavên xwe dîtibû"* (r.14). Gelo bi vê hevokê rewşa Dengxweşî naşibe mehqûmekî stûyê xwe ji benê sêdarê xelas kirîye?

Di *Şînmorîka Zînê* da Zînê gelek hez ji dayîka xwe dike û her dixwaze jê ra kulîlkan berhev bike. Her çi gava Zînê pêrgî muşkîleyekê tê ew pirsa xwe ji mezinên xwe dike, ji wan alîkarîyê dixwaze, bi vî awayî serdikeve. Wekî mînak ji bo ku morîka xwe dîsa bidest bixe ew pirsa xwe ji şivanî, kalê hilhilî û Feqîyê Teyran dike. Zînê di nav xwezayê, fêkîyan, kulîlkan, teyr û çûkan, av û kanîyên zelal da bi bextewarî dijî û ji xwezayê hez dike. Ji bo ku zarok jî bibin xasletên wiha baş, ji malbata xwe hez bikin, hezkirina xwe nîşan bidin, pirsa xwe ji mezinan bikin, hurmetê nîşanî xwezayê bidin, wê biparêzin ev nimûneyên di çîrokê da bi awayekî rast hatine bikaranîn

Di berhema *Kewên Gozel* da wexta Dengxweş kewa hêsîr, ku ji lingê xwe hatîye girêdan, dibîne wê demê gazindan jê diket bê ka herçend ku ew ji heman qewmî ne çima jê ra negotîye dehfik heye? Kewa hêsîr wiha bersivê dide wî *"Gava nefikirî û xwe li ciyan biqelibînî dawîya te ev e"* (r.20).

Dijberî çîrokên dî yên Öğütê di *Dara Pîroz* da mekân bajar e. Her wiha statûya dê û bavî jî di vê çîrokê da hatîye guhertin. Babê Zeryayê karmend e û dêya wê di marketekê da dixebite. Ev jî nîşan dide ku nivîskarên Kurd yên li ser edebîyata zarokan berheman dinivîsin têgihiştine ku êdî Kurd ji gundan zêdetir li bajaran dijîn û divê ev jîyana wan jî bikeve nav berhemên zarokan. Her tişt di dema me da zû bi zû diguhere, civaka Kurd her wiha zarokên Kurd jî ji vê guhertinê para xwe digirin. Ew wekî zarokên civakên dî zêdetir entegreyî teknolojîyê û medyaya civakî ne. Lewma divê edebîyata behsa wan dike jî ji van guhertinan hayedar bibe û behsa mijarên nû bike. Bi vê yekê zarok jî di wan berheman da xwe bibînin.

Li gor berhemên dî *Dara Pîroz* dirêjtir e. Belku jî ji ber vê yekê bûye ku nivîskarê xwestîye bûyerên pirtir xwe dispêrin serpêhatîyan û şîretan vebêje. Xala sereke ya di vê berhemê da hezkirin û hurmet nîşandana xwezayê, çandina mehsûlên xwezayî, hezkirina ajalan e. Lewma di vê berhemê da li ser hûrgilîyên jîyanê agahî tên dayîn û şîret tên kirin. Wekî mînak wexta behsa pişîka Zeryayê tê kirin tê gotin ku ew jê ra ji Wanê dîyarî şandine. Taybetîyên pişîkên Wanê jî ew e ku her çavekî wê bi rengekê ye. Pişîka Zeryayê Rindê jî çavekî wê şîn çavê dî jî zer e. Zerya gelek ji pişîka xwe hez dike, Rindê jî her car li dû Zeryayê ye.

Zerya bi tevgerên xwe wekî zarokeka temenê xwe hatîye nîşandan. Wexta ew nexweş dikeve ji bo wê qanih bike babê wê jê ra dibêje ji bo ku sax be divê ew herin doktor. Piştî vê xeberdanê Zerya jî ji pşîka xwe ra dibêje *"Rinda min ez naxwazim ji te biqetim; lê divê tu ez biçim doktor. Gava tu nexweş bikevî divê tu jî herî ser beytar"* (r.7). Her wiha çawa me li jor destnîşan kir, Zerya gelek ji hez malbata xwe dike. Wexta dê û babê wê behsa girîngîya çûna doktor dike jê ra dibêjin ku ji ber ku ew gelek hez wê dikin her kes dixwaze Zerya baştir bibe. Zerya jî jê ra dibêje *"Ez jî pir ji te hez dikim dayê. Ez ji bavê xwe jî hez dikim. Ez ji Rindê jî hez dikim. Ez ji hemû malbata me hez dikim."* (r.8).

Gelek caran wexta zarok nexweş dikevin ditirsin biçin nexweşxaneyê. Di vê çîrokê da jî bi rêya qanihkirina Zeryayê nivîskarê xwestîye wekî nimûneyeka baş nîşan bide. Wexta Zerya diçe nexweşxaneyê dibîne ku doktor û hemşîre kesên rûken in, ew "bibişirîna rûyê xwe bawerî"yê didin Zeryayê. Nexweşxane jî cihekî gelek paqij e û bi ronahî ye, paceyên wê fireh in. Piştî Zerya vê yekê dibîne jixwe ra dibêje *"Cîyekî xweş bûye, ez belasebeb ji nexweşxaneyê tirsîyame"* (r.9). Zerya ji doktora xwe hez dike, hişyarîyên wê guhdar dike.

Yek ji mijarên ku nivîskar dixwaze bala me bikêşe ser bikaranîna dermanên xwezayî ye. Wexta Zerya diçe nexweşxaneyê doktor jê ra dibêje ku *"gava derman di nav xwezayê de hebe, ez zû bi zû dermanên kîmyewî nadim kesekî"* (r.9). Lewma ew ji Zeryayê ra dibêje ji bo zikêşîya xwe mişmişên bêderman bixwe.

Wexta Zerya di xewna xwe da baxçeyekî mişmişan û dara mişmişê ya bi navê "Dara Pîroz" dibîne ligel wê diaxive. Ev dar gelek mezin û xweşik e, li ser şaxên wê tijî çûk veniştine. Zerya pirsa mişmişên bêderman ji darê dike, dar wiha bersivê dide:

*Ez ê tu carî qebûl nekim ku mirovên neqenc xwezaya fêkîyên min biguherînin. Ez ê tu carî qebûl nekim ku bi derman û hormonan tahm û rengê fêkîyên min, biguherînin. Ez ê tu carî nehêlim ku bi eslê min bilîzin. Ez dixwazim heta mirinê bi tovên dê û bavê xwe bijîm"* (r.14)

Gelo mînakeka dareka wiha serhildêr di vê çîrokê da dibe ku ji derveyî konteksta xwe da bê şîrovekirin? Di berdewama axaftina Zeryayê û darê da jî dar her car dixwaze bala Zeryayê bikêşe ser girîngîya "li ser eslê xwe bûyînê" yan jî "ji eslê xwe dûr neketinê". Dibêje ku herçend wê xwestîye darên dî jî li ser eslê xwe bimînin, "mirovên neqenc" ji bo ku qezenca xwe zêdetir bikin reng û tahma fêkîyên darên dî guhertine. Zerya jî di dûmahîka vê xeberdanê da ji darê ra wiha dibêje:

"*Xezî hemû dar li ser eslê xwe bimana û ewqas mezin û xweşik bûna. Xwezî mişmişên hemû daran ji bo mirovan derman bûna"* (r.16).

Wexta Zerya ji xewê hişyar dibe ji dêya xwe ra behsa xewna xwe, pirsa Dara Pîroz û mişmişên wê dike. Ew dixwaze bikeve li dû xewna xwe. Lewma piştî sax dibe dê û babê xwe qanih dike, diçe gundê xalê xwe nik dara mişmişê. Herçend ku wê ne bi tena serê xwe û ne di nav serpêhatîyan da xewna xwe pêk anîye dîsa jî ev nimûne ji zarokan ra nîşan dide ku divê ew bikevin li dû xewnên xwe. Piştî Zerya ligel xalê xwe diçe li quntara çîyê, dûmahîka Gelîyê Kûr, nezîk li Kanîya Spî digihe dara ku di xewna xwe da dîtîye. Spasîya darê dike, ji xalê xwe ra dibêje ku ew dixwaze tovê vê dara mişmişê li hemû cîhanê belav bike. Gelo mirov vê daxwaza Zeryayê dikare di çarçoveya mijara îdeolojîya di berhemên zarokan da wekî xeyala nivîskarê jî şîrove bike? Çi eşkere çi nerasterast sedemê sereke ya hebûna îdeolojîyê di deqekê da ligel wateya esil ya deqê xwedîyê wateyên din e jî. Bi gotineka dî çawa ku îdeolojî di sêgoşeya nivîskar, xwîner û deqê da derdikeve holê xwîner jî bi rêya bûyerên di deqê da digihe wateyekê (Tüfekçi Can, D. 2013:201). Li gor vê yekê em dikarin bibêjin *Öğüt*ê di berhemên Dara Pîroz û Kewên Gozel da ji bilî wateyên sereke yên berhemê ne bi awayekî eşkere be jî xwestîye îdeolojîya xwe ragihîne. Di herdu çîrokan da jî zarok dikarin di navbera sedem û encamên bûyeran da

têkilîyekê deynin. *Öğüt*ê di Kewên Gozel da "Kurd" û "kew"ê wekî du hêmanên wekhev dibîne. Di Dara Pîroz da jî bi belavkirina tovên darê li cîhanê wê barekî mezin daye ser pişta Zeryayê. Dîsa jî ew îdeolojîya xwe, bi zorîyê li zarokan nade pejirandin. Serlehengên herdu çîrokan Dengxweş û Zerya bi xwe biryara xwe didin û di encamê da Dengxweş poşman dibe lê Zerya digihe miraza xwe. Lewma nivîskar ji zarokên ra derîyê şîroveyê û peywendîkirinê vekirî dihêle, îdeolojîya xwe li ser wan ferz nake.

## 3.4. Hêmanên Folklorê

Wekî mijar hêmanên folklorê pirtir di perwerdehîya zarokan da tê bi kar anîn. Mirov dikare di bermehên zarokan da nirxên çandî, neteweyî û civakî bi rêya lîstîkên zarokan yên gelêrî, mamik, zûgotinok, qewlêrk, metelok, lorî, biwêj, bijîşkî û bawerîya gelêrî, gotinên pêşîyan, çîrvanok hwd. ragihîne zarokan. Lewma hêmanên folklorê ji bo edebîyata zarokan her wiha perwerdehîya zimanî jî çavkanîyeka kêrhatî ye. Bi van hêmanan zarok dibe xwedan hişmendîya zimanî, neteweyî û nirxên exlaqî. Di dûmahîka gelek hêmanên folklorê û çanda gelêrî da ji bo xwîneran yan jî zarokan peyamek cih digire. Bi vê yekê zarok dikarin dersan jê derxin û behremendîyên xwe yên muhakemekirin û hizirkirinê bi pêş bixin (Artun, 6-7). Öğütê jî di berhemên xwe da ciha daye hêmanên folklorîk. Lewma wê him sînorê vegotinê fireh kirîye him jî zarok ji folklor û çanda xwe hayedar kirine, ev hêman wekî çavkanîyekê bi kar anîye.

Di çîroka *Xezal û Qertel*ê da Xezal û Qertel ligel têjikên xwe ji şevê heta berê sibê li ber agirî, şevbuherkan li dar dixin. Wekî tê zanîn di şevbuhêrkan da dengbêj strana dibêjin lewma wekî hêmanekî folklora Kurdî şevbuhêrk xwedîyê cihekî girîng e. Di vê çîrokê da jî nivîskarê xwestîye vê kevneşopîyê ragihîne zarokan da ku haya wan ji çanda wan hebe. Heke em mekanên van çîrokan yên wekî Deşta Mûşê, Çîyayê Sîpanê û Behra Wanê binêrin em dikarin bibêjin ku ew di gelek nimûneyên folklora Kurdî da cih digirin. Di destana Xecê û Sîyabend da Çîyayê Sîpanê û Behra Wanê, di stranên dengbêj û stranbêjan da jî Deşta Mûşê wekî mekan tê dîtin.

Li dijberî çîroka *Xezal û Qertel*ê di *Kewên Gozel* da di despêka çîrokê da mekan deşta Mûşê ye. Dengxweş û Rengxweş ji vir ber bi Çîyayê Sîpanê û Behra Wanê ve diçin. Lewma em heman mekanan lêre jî dibînin. Dîsa kew, ku ew yek ji ajalên di folklora Kurdî da ye, di vê çîrokê da lehengê sereke ye. Lewma wexta zarokên Kurd di van çîrokan da rastî kewê tê ew li ber çavê wan wekî ajalekî seyr nîne, jixwe di çand û erdnîgarîya wan da ew heye.

Wexta zarok çîroka *Şînmorîka Zînê* dixwînin ji jîyana Kurdan ya gund hayedar dibin. Ka gelo di vê jîyana rojane da Kurd çawa bi çanda xwe dijîn. Wekî mînak ew dê guhdarîya bilûra şivanî bikin. Erdnîgarî û xwezaya xwe û Ava Spî hîn bibin. Wekî şairêkî Kurd yê klasîk dê Feqîyê Teyran nas bikin. Bizanin ku ew ji zimanê teyran fahm dike, ligel Ava Spî diaxive, helbestan li ser dinivîse. Wexta zarok di wêneyan da mîrê teyran dibînin dê hîn bibin ku navê wê tawis e û di folklora Kurdî da û ji bo bawerîya Kurdên Êzidî girîng e.

Di *Dara Pîroz* da mekanê çîrokê ji gund ber bi bajêr, ji jîyana gundewar ber bi şaristanîyê ve guhertîye kêm hêmanên folklorê cih digirin. Ev jî nîşan dide ku divê nivîskarên Kurd yên berhemên zarokan dinivîsin rêyên nû yên vegotin û ragihandina hêmanên folklorîk bigerin. Di vê çîrokê da bi tenê em dikarin emelkirina mişmişên xwezayî di nav çarçoveya bijîşkîya gelêrî da binirxînin.

## 3.5. Ziman

Edebîyata zarokan ji alîyê zimanî, hîsî, civakî, hişî ve pêşveçûna zarokan nîşan dide. Zarok bi rêya berhemên edebî zimanê xwe nas dike, têdigihe, peyvan hîn dibe û wan bilêv dike, digihîne hev, di nav hevokan da bi cih dike û herî dûmahîkê jî diaxive. Bi taybetî zarok di navbera 3 û 6 salîyê da hêdî hêdî rêzikên zimanî hîn dibe. Di vê qonaxê da berhemên zarokan ji bo pêçvebirina zimanî xwedîyê roleka girîng in (Köprülü, 2015:21). Zarok zimanê xwe di nav malbatê yan jî civakê dibihîze lê bi taybetî bi alîkarîya berhemên zarokan ew zêdetir peyvan hîn dibe, zimanekî edebî û estetîk nas dike, jê hez dike. Lewma berhemên zarokan ji bo hînbûna zimanî çavkanîyên sereke ne. Öğütê jî di her sê berhemên xwe yên pêşîyê da ligor temenê zarokên pêşdibistanê bi zimanekî sade û hevokên kurt çîrokên xwe nivîsîne. Lê di berhema xwe ya dûmahîkê da (*Dara Pîroz*) em pêrgî hevokên dirêjtir û zimanekî girantir tên. Ev guhertina zimanî jî ji ber ku ev berhem ji bo zarokên dibistana navîn hatîye nivîsandin, pêk hatîye.

*Xezal û Qertel* bi gelemperî bi hevokên kurt hatîye nivîsandin. Di çîrokê da em ravekên navdêr (keviyên behrê, rojeke biharê) û rengdêran (Xezala çavreş, ezmanê bilind), dubareyan (kêf û xweşî, gul û kulîlk), şayesandinan (Xweza birengê sor xemilandibû) dibînin. Herçend ku çîroksazî bi peyvên şênber hatibe vegotin jî em pêrgî bikaranînên razber jî tên. Wekî mînak wexta behsa Qertelê tê kirin wiha tê gotin: *"...Pêşiyê ji ezmanê bilind ve li wê behra xweşik temaşe dikir. Kêf û xweşîya azadiyê li nezî ewran tahm dikir."* (r.9). Lêre "ewr" peyveka şênber e. Nivîskarê dîsa bi peyveka şênber, "tahmkirin"ê xwestîye peyveka razber, "azadî"yê rave bike. Lewma bi bikaranîna "tahmkirina azadîyê" ev rewş vegotîye.

Di *Kewên Gozel* da jî bi gelemperî hevokên kurt, bikaranînên wekî ravekên rengdêran (hêlineke rind, behra mezin hwd.), navdêran (serê sibê, cara yekem) dibînin. Her wiha em bikaranînên razber (avjenîya xeyalan, mirinê li ber çavê xwe dîtibû) jî dibînin. Ev jî nîşa dide ku nivîskarê xwestîye hinek bi zimanekî dewlemend çêjeka estetîk bide zarokan.

*Şînmorîka Zînê* him bi pexşanê him jî bi helbestê hatîye nivîsandin. Lewma ji bo ku zarokên Kurd hay ji çanda xwe ya helbestê jî hebin ew nimûneyeka baş e. Dîsa wekî berhemên dî yên Öğütê di vê çîrokê da jî dubare (kêf û şahî, pel û şax), hevokên ku asoyê zimanê zarokan fireh dike (di kakilên kulîlkan de fêkiyên teze amadekariya havînê dikirin) û ravekên navdêr û rengêran (dengê teyr û tilûran, qoreke morîkên şîn), peyvên dengên xwezayî (xuşexuş, şireşir) hatîne bikaranîn.

Di *Dara Pîroz* da ji ber ku ev çîrok li gor yên dî dirêjtir e em pêrgî vegotineka berfirehtir, zimanekî girantir tên. Lê ev neyê wê wateyê ku zimanê vê berhemê li gor temenê zarokên dibistana navîn nehatîye nivîsandin. Lêre em hevok û şayes û dîyalogên dirêjtir dibînin.

### 3.6. Dîtbarî

Berhemên zarokan peşîyê bi rêya dîtbarîyê ve bala zarokan dikişînin. Di van berheman da divê deq, ziman û wêne di nav hevsengîyekê da bibin. Ji ber ku dîtin berîya axaftinê tê zarok berî axaftinê bi fêkirinê berheman nas dike. Jixwe serpêhatîya xwendinê jî bi peyv û wêneyên li ser bergê dest pê dike. Sê erkên wêneyê hene. Wêne deqê dixemilîne, şîrove dike û tewaw dike. (Ji J. Berger û yên din rghnr. Uğurlu, 2010:1931) Di berhemên ji bo zarokan da ligel firehîya (Ing. extent) pirtûkê, bergê wê, taybetîyên dî yên şiklî û rengandinê, awayê nivîsê, puntoya wê, dûrahîya di navbera rêzikan jî girîng in. Ji bo zarokên di navbera temenê 0 û 11 salî da mijar ji nivîsan zêdetir ji alîyê dîtbarî ve tê fêmkirin. Lewma ji bo vî temenî wêne ji nivîsan girîngtir in (Bilkan, 2018:26). Li gor van rêzikên dîtbarî yên berhemên edebîyata zarokan em dikarin bibêjin ku di hersê berhemên *Öğüt*ê yên pêşîyê da di navbera nivîs û wêneyan da hevsengîyek heye. Wêne bi rengên cuda hatîne rengandin. Şiklên tê da jî girîft nînin û ew bi awayekî hêsan hatine dirûvandin. Ev jî hînkirin û têgihîştina berhemê bo zarokan hêsan dike. Lê di *Dara Pîroz* da em di navbera wêne û deqê da hevsengîyekê nabînin.

*Xezal û Qertel* ji 28 rûpelan pêk tê. Lê em dibînin ku numreya rûpelê li ser nehatîye nivîsandin. Ji bilî rûpela destpêkê û dawîyê ji 26 rûpelan di 13an da nivîs û di 13ên dî da jî wêne cih digirin.

Edîtor (Ulku Bîngol), Wêne (Murat Yapıcı), Pedagog (Bilal Dogan), Redaksiyon (Mehmet Akçakaya), Bergsazî û Mîzanpaj (Ridwan Polat).




*Kewên Gozel* ji 24 rûpelan pêk tê. Dijberî çîroka *Xezal û Qertel*ê numreya rûpelê li ser hatîye nivîsandin. Ji van 26 rûpelan ji bilî rûpela destpêkê û dûmahîkê di 13an da nivîs û di 13an da jî wêne cih digirin.

Edîtor (Ulku Bîngol), Wêne (Murat Yapıcı), Pedagog (Tülay Koç), Redaksiyon (Rêdûr Dîjle), Bergsazî û Mîzanpaj (Ridwan Polat).




*Şînmorîka Zînê* ji 24 rûpelan pêk tê. Di vê berhemê da jî numreya rûpelê li ser nehatîye nivîsandin. Ji van 24 rûpelan ji bilî rûpela destpêkê û dûmahîkê di11an da nivîs û di 11ên da jî wêne cih digirin.

Edîtor (Ulku Bîngol), Wêne (Murat Yapıcı), Redaksiyon (Weşanxaneya Hîva), Bergsazî (Qerbelek), Mîzanpaj (Ridwan Polat).




*Dara Pîroz* ji 31 rûpelan pêk tê. Di nav van rûpelan da carinan biçûk carinan jî mezin 10 wêne hatine bicihkirin. Ji ber ku ev berhem ji bo zarokên dibistana navîn hatîye nivîsandin hejmara wêneyan li gor berhemên Öğütê yên din kêmtir e. Lewma çawa ku temenê zarokan mezin dibe di berhemên zarokan da wêne cihê xwe ji nivîsan ra dihêlin. Ji 10 wêneyên *Dara Pîroz* da, wêneyek 3 caran hatîye bikaranîn.

Wênesaz (Bilal Karagöz), Bergsazî û Mîzanpaj (Ridwan Polat), Redaksiyon (Îsmaîl Dîndar)




Her wiha wêneya ku lehengên çîrokê dide nasandin da mirov baş fêm nake çima dê û babê Zeryayê wekî hevalên wê yan jî jê hinek mezintir hatîne xêzkirin

## 4. Encam

Her çend ku nimûneyên pêşî yên edebîyata zarokan ya Kurdî berîya demeka dirêj derketine holê di roja me da mirov nikare bibêje ev cureya edebîyatê gelek bi pêş ketîye. Dîsa jî di çend salên dûmahîkê da çi ji alîyê weşangerîyê çi ji alîyê zêdebûna nivîskar û berhemên vê edebîyatê di vê qadê da livdarîyek tê dîtin. Me dît ku wekî nûnerek ji nifşê nû yê vê edebîyatê Öğüt di berhemên xwe da bêtir dixwaze bala xwîneran bikêşe mijara zayenda civakî ji ber vê yekê wê di her berhemeka xwe da cih daye vê mijarê. Di navenda wan berheman da karakterên jin hene. Lewma ew di bijartina karakterên sereke û alîkar da cih dide jinan. Bi vê yekê wê xwestîye rê li pêşîya newekhevîya zayendî bigire û klîşeyên zayenda civakî berovajî bike. Miqabilî vê hewildanê dîsa jî wê bi temamî neşîyaye xwe ji klîşeyên zayenda civakî xelas bike. Wekî mînak jinên ku ew di çîrokên xwe da cih dideyê li rexekî gelek baş li hespî siwar dibin, di nav civatê da xwedan statûyên payebilind in lê li rexê dî li hewşa malê galegalê dikin û wekî bi tenê karê jinan be ew bi satilan avê dikêşin.

Di berhemên xwe da Öğüt ji zarokan ra behsa girîngîya nirx û mijarên wekî hevaltî, fedakarî, alîkarîxwazî, pêkvejîyanê, rêwîtî, hezkirina malbatê, xwezayê û ajalan hwd. dike. Wê hewil daye ku vê yekê ne bi helwesteka lêferzker (Ing. imposing), di nav çarçoveya pîvanên edebîyata zarokan da, bi awayekî xwezayî bike. Heta cihekî bi ser ketîye lê carinan jî ew tehisîye. Öğüt di berhemên xwe da nakeve dehfikê ku îdeolojîya xwe li zarokan bide qebûlkirin. Lê wekî di mijara ji zarokan ra behskirina mirinê da jî me dît ku divê ew zêdetir baldar bibe û li gor riwangeha zarokan li rêyên nû yên ragihandinê bibîne.

Ji bo ku bi awayekî hêsantir fikrên xwe bigihîne zarokan Öğütê hêmanên folklora Kurdî wekî çavkanîyeka sereke bi kar anîye. Zarok wexta ajalên wekî xezal yan jî kewan, çalakîyên folkorê yên wekî şevbihêrkan, jîyana Kurdan ya gundewarî, mekanên folklorîk yên wekî Çîyayê Sîpanê, Behra Wanê, Deşta Mûşê di çîrokan da dibîne hîn dibe ku ew di heman demê da di folklora Kurdî da nimûneyên belavbûyî ne. Her wiha ew nîşan dide ku êdî zarokên Kurdan bi giştî li bajaran dijîn lewma behsa muşkîleyên jîyana zarokan ya li bajêr û metirsîyên wan kirîye, mekanên berhemên xwe berfireh kirîye.

Öğüt li gor temenê zarokan ketîya nav hewildana avakirina zimanekî. Ev hewldan di dîtbarîya berheman û avakirina hevsengîya navbera nivîs û wêneyan da jî tê dîtin.

Her sê berhemên wê yên pêşîyê ji bo zarokên pêşdibistanê hatine nivîsandin. Lewma ew bi zimanekî sade û hevokên kurt hatine nivîsandin. Di van berheman da ravekên navdêr û rengdêran, peyvên dubare û dengên xwezayî hatine bi kar anîn. Her wiha Öğütê hewil daye asoyê zimanê zarokan dewlemend bike. Wekî mînak ji bo ravekirina peyvên razber wê peyvên şênber bi kar anîne. Di van her sê berheman da nîvîya pirtûkê ji nivîsan nîvî jî ji wêneyan pêk tê. Lê ji ber ku berhema *Dara Pîroz* ji bo zarokên temenê dibistana navîn hatîye nivîsandin hevokên dirêjtir û zimanekî girantir hatîye bi kar anîn. Her wiha di vê pirtûkê da hejmara rûpela nivîsan ji wêneyan zêdetir e û heman wêne ji carekê zêdetir hatîye bikaranîn lewma ji alîyê dîtbarîyê ve jî kêmasîyên wê hene.

## Çavkanî


B. Diekman, A. & Murnen, S. K. (2004). Learning to Be Little Women and Little Men: The Inequitable Gender Equality of Nonsexist Children's Literature. *Sex Roles*, 50 (5/6), 373-385.

Bilkan, A. Fuat.(2018). Çocuk Edebiyatı-Kavram ve Mahiyet. İçinde: *Hece Dergisi Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı.* 2. Baskı, (s.24-35) Ankara: Hece Yayınları

Kortenhaus, C.M. & Demarest, J. (1993). Gender Role Stereotyping in Children's Literature: An Update. *Sex Roles*, 28(3/4), 219-232.

Köprülü, S. G. (2015). Çocuk Yazını Çevirilerinin Çocuğun Dil Gelişimine Etkisi. *Kafkas Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi.* (16), 19-37.

Öğüt, B.A. (2014). *Xezal û Qertel.* Diyarbekir: Weşanên Hîva

Öğüt, B.A. (2014). *Kewên Gozel.* Diyarbekir: Weşanên Hîva

Öğüt, B.A. (2016). *Şînmorîka Zînê.* Diyarbekir: Weşanên Hîva

Öğüt, B.A. (2020). *Dara Pîroz.* Diyarbekir: Weşanên Morî

Subaşı, K. (2017). Kurtedîroka Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî. *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi.* 9(1/17), 107-132.

Şen, E. (2016). Çocuk Edebiyatında Bir Yaşam Gerçekliği Olarak Ölüm Olgusu Üzerine Bir İnceleme (Sevim Ak Örneği. *Uluslararası Türk Kültür Coğrafyasında Sosyal Bilimler Dergisi (TURKSOSBİLDER*), 01(01), 14-23.

Tek, A. (2019). Evdirrehîm Rehmî Hekkarî û Berhemên wî yên ji bo Biçûk, Ciwan û Jinan. *The Journal of Mesopotamian Studies*, (4)1, 51-71.

Tüfekçi Can, D. (2013). Çocuk Edebiyatında Dilin İdeolojisi: Anlatı Bilimsel Yaklaşım. *Dil Araştırmaları*.(12), 191-213.

Tosun, T. (2018). Edebiyata Zarokan a Kurdî li Bakur. *Govara Zanstên Mrovayetî ya Zankoya Zaxo*, (6), 147-154.

Uğurlu, S.B. (2010). Çocuk Edebiyatı Eleştirisi. *Turkish Studies*. 5/3. 1921-1945.

Ya-Lun T. (2008). Gender issues in young children's literature. *Reading Improvement*. 45(3), 108-114.


### Çavkanîyên Elektronîk


Artun, E. Ortak Türk Kültürü Ürünlerinin Çocuk Edebiyatına Katkıları. (Têketin: 01.09.2020) http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman_artun_ortak_turk_kulturu_cocuk_edebiyatina_katkilari.pdf

Bayram, M. (2020). Di Pirtûkên Çawalêhato yên Zarokan de Kuştin, Xwîn û Tecawiz Hene. (Têketin: 13.07.2020), http://www.ortadogunews.com/ozel-haber/di-pirtkn-cawalhato-yn-zarokan-de-kustin-xwn-tecawiz-h3946.html

Eroğlu, İ. (2016). Berfîn Ayşe Öğüt: Dixwazim Bibim Evlatlixa Uzayliyekî (Têketin: 10.07.2020) https://inanolo.blogspot.com/2016/10/berfin-ayse-ogut-dixwazim-bibim.html

Pirtukakurdi. Kürtçe Çocuk Hikâyeleri (Têketin: 03.09.2020) https://www.pirtukakurdi.com/kategoriler-tr/kurtce-cocuk-hikayeleri-365-tr

Yorulmaz, A. (2016). Zarokên kurd bê wêje mezin dibin. (Têketin: 03.09.2020) https://www.basnews.com/kr/babat/285839